Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :466 nameronahi@gmail.com 12-Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

Siwêdîkê çavkaniya aramî û jiyanê ye

Li Dêrika Rojavayê Kurdistanê gelek cihên dîrokî ku ji gelek şaristaniyan re malovanî kiriye hene. Yek ji van cîhan Sewêdîkê ye. Swêdîkê bi hewa û xwezaya xwe ya xweş weke şaxekî bihûştê ye. Mirov dema ku tê vir bêhna wan fireh dibe û xwe hêsayî dibin.

Jêderka Şaristaniyê Siwêdîkê li Dêrika Rojavayê Kurdistanê ye. Ev der bi xwezaya xwe bi şikeftên xwe yên kevnar tê naskirin. Di heman demê de niha wekî cihekî tûrîzmê tê pênasekirin. Li pêşberî Swêdîkê çiyayên gelek bilind yên weke Cûdî jî hene ku mirov ji ber heybeta wan matmayî dimînin.

Li Siwêdîkê nêzî 30 kanî hene û her şaxekî avê jî ji cihên cuda diherike. Ev jî dibe sedema şînahiyê. Li deşta wê jî her cure fêkî hene. Tama fêkiyên wê jî gelek xweşin û xwezayî ne. Li gor lêkolînên herî dawî emrê şikeftên Sewêdîkê digihêje heta hezar salan. Jêderka şaristanî û jiyanê ye.

Di serdemên berê de Siwêdîkê ji bo gelan bûye stargeh. Gel ji bo ku xwe ji xetereyan biparêze di şikeftan de diman. Her çîrokek şikeftekê cuda ye. Dema ku bihar tê jî gelek xweş dibe. Gelek mirov tên wir û li aramiyê digerin...*Rûken Goman*

Li Helebçeyê dema berhevkirina hinaran e

Mîna salên borî, îsal jî li Helebce xwediyên baxçeyên hinaran dest bi çinîna hinaran kirin. Tevî ku tê gotin ku heta baran li hinaran neke tam nagirin, lê li herêmên têr hinar ji destpêka payîzê ve çinîna hinaran destpê kiriye.

Li Başûrê Kurdistanê, herêma Hewreman û Helebce di warê hinaran de bi navûdeng in. Hem di warê xweşiya hinaran de hem jî zêdebûna hinaran de.

Li Helebce çend curên hinaran hene, salane di 500 donim erazî de, zêdeyî 20 hezar ton hinarên baş tên komkirin.

Gelek ji van hinaran li bazarê tê firotin. Hinekê ji dikin rûbe û şerbeta hinaran. Herwiha ji bo sewalan sûd ji tovilê wan tê girtin.

Li Helebce ev cureyên hinaran hene; salexanî, lareşe, xofiroşî, kewe, beles, şîrinî navspî û mêxoş in. Lê di nava van hemûyan de, herî zêde salexanî tê hezkirin. Ji ber ku di warê tam de, ne tirşe û ne jî şirîn e, ango mizin. Herwiha rengê libikên wan ji gelek xweşikin.

Dema ku demsala çinîna hinaran destpê dike, ji bo welatiyan derfetê kar çêdike ku kar bikin.

Ji ber ku welatên cînarê Herêma Kurdistanê kêm hinar derbasî Herêma Kurdistanê dibe, ji bo kesên xwediyê baxçeyên hinaran derfetekî baş e. Ji bo ku bikarin berhemên xwe bi bihayekî baş bifiroş in. Lê, hinek salan ji ber zêdebûna hinaran bihayê hinaran gelek dikeve.

Jina bi navê Fatma Heme Salih a ku li Helebce rojane weke karker diçe nava baxçeyê hinaran, diyar kir ku ji bo karê çinîna hinaran, ji destpêkirina çinîna hinaran heta meha mijarê ji navçeya Şarezûr tên Helebce û got ku rojane bi 20 hezar dînar kar dikin.

Herwiha Bîlan Mihemed yê ji gundê Kuliknî û xwedî baxçeyê hinaran e qala taybetmendiya vê demsalê ji bo baxçevanan kir û got; "Dema ku hinar çêbûn, weke cotkar em dest bi çinîna wan dikin. Piştre em yên baş ji bo firotinê cuda dikin. Dema hatin cuda kirin em ji bo bazarên Silêmaniyê û Helebce dibin û difiroş in."...*ROJNEWS*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 466 12- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

Li bakur û başûr 9 leşkerên Tirk hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî rêze çalakiyên gerîla yên li dijî artêşa Tirk lidar xistîn daxuyaniyek da. HPG'ê ragihand di çalakiyên çarçoveya ' Pêngavên Şoreşgerî' yên li Sêrt, Lêlîkan, Herêma Barzan û Sîdekanê li dijî dagirkeran hatiye lidarxistin, bi kêmanî 9 leşkerên Tirk hatine kuştin.*R-2*

ÇETE BÊ ASTENGÎ JI TIRKIYÊ DERBASÎ SÛRIYÊ BÛNE

Têkiliyên dewleta Tirk û komên çete yên weke El Qaîde û DAIŞ ji aliyê hemû cîhanê de tê zanîn û ev têkiliyên wan heta roja îro jî dewam dike. Bi taybet bi destpêkirina şerê Sûriyê re dewleta Tirk çeteyên DAIŞ'ê û Nusra perwerde kir, çek da wan û ew şandin Sûriyê. Heta niha hêjmareke zêde çeteyên ku dîl hatine girtin ev yek îtiraf kirine.

3 ÇETE BI SAXÎ HATIN GIRTIN

Operasyonên hêzên taybet yên YPG'ê li dijî şaneyên razayî yên çeteyan dewam dike. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku endamên Y.A.T ên girêdayî YPG'ê bi çalakiyeke taybet a li dijî şaneyên razayî yên çeteyan çalakiyek kirine û di çalakiyê de 3 çeteyên Tirk, Elman û Kanadayî yên DAIŞ'ê bi saxî girtine.

TIRKIYE RÊYA DERBASBÛNA DAIŞ'Ê YE

Çete di îtirafrên xwe de diyar dikin ku ew li ser Tirkiyê re derbasî Sûriyê û tevlî DAIŞ'ê bûne. Çeteyê bi navê Dirk Richard Pleil di sala 2015'an de li ser sînorê Tirkiyê re derbas bûye. Çeteyê bi navê Mihemed Elî yê ji Kanadayê ye, sekvanekî taybet ê DAÎŞ'ê ye û li ser Tirkiyê re derbas buye. Çeteye bi navê Ergün Orhan yê ji Tirkiyê jî bê astengî derbas buye. *R-2*

Ji bo Ocalan li Ewrûpayê gel dadikeve qadan

Roja 13'ê Cotmehê li seranserî welatên Ewropa yê gel ji bo şermezar kirina komploya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêber Ocalan dadikeve qadan. Dîwana Hevserokatiya KCDK-E û TJK-E'yê têkildarî meş û çalakiyên li dijî Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê daxuyaniyek da û banga tevlêbûna çalakiyan kirin. *R-5*

Rojava li dora Ocalan bûye yek

Heyetek ji 7 endamên Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Enternasyonalîst serdana Rojava kir. Yek ji endamên heyetê, Berdevka Femînîst a Spanya Madrîdê Consûelo Nûnez diyar kir ku dewleta Tirk êşkence û zilmeke giran li gelê li Efrînê dike û got, "Divê em ji hêviya vegerê ya gelê Efrînê re bibin bersiv." *R-3*

Di her kes li ber tecrîdê rabe

Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan, destnîşan kir ku rewşa Îmraliyê tecrîd derbas kiriye û diyar ku biryara DMME'yê ya derbare Ocalan de biryareke siyasî ye. Mihemed Ocalan bang li hemû saziyên navnetewî yên mafên mirovan û kesên demokrat kir ku ji bo rakirina tecrîdê bikevin nava tevgerê. *R-4*

Erdogan îxbar dike, dozger û polîs jî pêk tînin

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku operasyona li dijî partiya wan amadekariya li dijî hilbijartinê ye û got: "Em dizanin kê îxbar kiriye. Erdogan her roj îxbar dike. Bi van êrîşan ew tu kes dev ji têkoşîn û sekna xwe bernede." *R-4*

Pêngava Bagera Cizîrê: 38 çete hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemiyê ya QSD'ê bi daxuyaniyekê encamên şerê 24 saetên dawî yê Pêngava Bagera Cizîrê eşkere kir. QSD'ê ragihand ku di çarçoveya qonaxa dawîn "Şerê Tinekirina Terorê" de 38 çete hatin kuştin û 11 bargehên wan hatin rûxandin. Her wiha QSD'ê diyar kir ku dest danîn li ser hêjmareke zêde çek û cebilxaneyên çeteyan. *R-5*

YPG'ê li Efrînê derbên giran li çeteyan xist

YPG'ê destnîşan kir ku di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê de li Efrînê hêzên wan çalakiyên xwe yên li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê didomînin. YPG'ê diyar kir di 9 û 10'ê Cotmehê de yekîneyên wan li navçeyên Şiyê, Raco û Cindirêsê rêzeçalakiyên bi bandor pêk anîne û di encama van çalakiyan de 4 çeteyên DAIŞ'ê hatine kuştin. *R-2*

NPG'ê ji bo çalakiya li Çelê gêrîla pîroz kir

Fermandariya Biryargeha Navendî ya Parastina Gel gerîlayên bi çalakiyekê li Çelê 6 leşkerên Tirk kuştin, pîroz kir. NPG'ê got, ""Çalakiya we ya 9'ê Cotmehê ya li Başûrê Kurdistanê li ser Girê Koordînê ya li dijî hêzên dagirker ên mêtingeriya Tirk, çalakiyeke encamgir û serkeftî ye. *R-5*

2018'an de 56 nûçegihan hatin kuştin

Li tevahiya cîhanê hijmara nûçegihanên ku 9 mehên pêşî yên îsal hatin kuştin, ji ya par zêdetir e. Li gorî Rêxistina Nûçegihanên Sînornenas (RSF) 9 mehên pêşî yên îsal 56 nûçegihan hatine kuştin. Di daxuyaniyê de hate gotin par di 12 mehan de 55 nûçegihan hatibûn kuştin. *R-5*

Mîhrîcan diyarî berxwedana Serdemê hate kirin

Mîhrîcana Osman Sebrî ya duyemîn li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya Qamişlo dest pê kir. Hejmareke zêde rewşenbîr û helbestvan ji seranserî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdarî mihrîcanê bûn. Mîhrîcan diyarî berxwedana Serdemê ya Efrînê hate kirin. Mihrîcan wê sê rojan dewam bike. *R-7*

YAT'ê sê çeteyên DAIŞ'ê bi saxî girt

Navenda Ragihandinê ya YPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku endamên Y.A.T ên girêdayî YPG'ê bi çalakiyeke taybet a li dijî şaneyên razayî yên çeteyan çalakiyek kirine û di çalakiyê de 3 çeteyên Tirk, Elman û Kanadayî yên DAIŞ'ê bi saxî girtine.

Navenda Ragihandina YPG'ê ragihand ku di encama operasyoneke taybet ya Yekîneyên Antî Terorê (Y.A.T) de 3 çeteyên bi eslê xwe Tirk, Elman û Kanadayî bi saxî hatine girtin.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku endamên Y.A.T ên girêdayî YPG'ê bi çalakiyeke taybet a li dijî şaneyên razayî yên çeteyan çalakiyek kirine û di çalakiyê de 3 çeteyên Tirk, Elman û Kanadayî bi saxî girtine.
Navenda YPG'ê têkildarî çeteyan agahiyên berfireh parve kir: "Berxwedana me ya li hember çeteyên barbar ya DAÎŞ'ê ku ji Ewropa heya Asya û heya Rojhilata Navîn wehşetan pêk aniye berdewam dike. Operasyonên serkeftî ku li Kobanê û Cizîrê hatine meşandin û herî dawî jî Pêngava Bagera Cizîrê ku li Dêrezorê berdewam dike îspatên herî berbiçav e. Şerê me yê berxwedanê ku îro li Rojava û Bakurê Sûriyê berdewam dike, bi serkeftinên ku di her pêngavê de xistiye dest bûye hêviya mirovahiyê. Ev têkoşîna ku li erdnîgariya Rojhilata Navîn û Kurdistanê dixe bin misogeriyê li gor her demê hê bi hêztir bi serkeftinên girîng berdewam dike. Ev pêkhateya ku bingeha xwe ji her şêweyên feraseta paşverû girtiye, ji welatên Ewropa gelek kes tevlî bûye û li gelek welatan jî firsenda rêxistinkirinê taybet bidest xistiye. Bi taybet jî şaneyên razayî ya vê pêkhateyê ji bo li Rojava û Bakurê Sûriyê komkujiyan pêk bînin xebatên taybet dane meşandin û ketine tevgerê. Wekî hêzên YPG û YPJ li hember van şaneyan operasyonên me yên serkeftî pêk hatine û ev dem bi dem ji raya giştî re hatine parvekirin. Di derbarê vê de ji tîmên me yên Antî Teror (Y.A.T)'ê di encama operasyonek taybet de ku pêk anîn 3 çeteyên ku eslê xwe Tirk, Elman û Kanada ne hatine girtin.

AGAHIYÊN BERFIREH ÊN TÊKILDARÎ ÇETEYAN

* Çeteyê bi navê Dirk Richard Pleil ku di sala 2015'an de li ser sînorê Tirkiyê derbas bûye û tevlî çeteyên DAÎŞ'ê bûye, li laboratuarên protez a DAÎŞ'ê de kar kiriye û di demên cuda de jî di çalakiyên derveyî mirov a çeteyên DAÎŞ'ê de cihê xwe girtiye.
* Çeteyê bi navê Mihemed Elî a ji Kanadayê ye jî, sekvanekî taybet ê DAÎŞ'ê ye. Ev kes li Reqa, Dêrezor û Hesekê de tevlî şer bûne. Ji rêxistinê re bi hezaran endam perwerde kiriye û di heman demê de tevlî dehan çalakiyên derveyî mirovane bûye. Di heman demê de ev kes ku dema li ser sînorê Tirkiyê dema derbas bûye rastî ti astengiyan nehatiye, dîsa bi hezaran çeteyên ku li ser sînorên Tirkiyê de derbasî Sûriyê bûne vana jî him ji îtîrafên çeteyên DAÎŞ'ê û him jî di lêkolînên me de derketiye holê. Di nav rêxistinê de navê Ebû Tûrab El-Kanadî bikar aniye û li ser malperên civakî ji bo tevlîbûnê nav refên DAÎŞ'ê bangawazî kiriye. Piştî êrîşên li Quebec û Ottawayê ên rê li ber mirina leşkeran vekiribû, li ser malpera civakî bangawaziya zêdekirina êrîşan kiriye û daye diyarkirin ku çi sîvîl, çi hêzên ewlehiyê 'kesên bêbawer' divê werin kuştin. Elî li ser malperên xwe yên civakî daye diyarkirin ku kesên ku bixwazin werin tevlî bibin, dikarin dema gihiştin Tirkiyê bi wî re bikevin têkiliyê, tê zanîn ku ev kes komekî Toronto li ser Tirkiyê derbasî Sûriyê kiriye û tevlî DAÎŞ'ê kiriye.
* Çeteye bi navê Ergün Orhan yê ji Tirkiyê ku tevlî çeteyên DAÎŞ'ê bûye, li Elmanya hatiye dinê, li ser malpera civakî xwe gihandiye DAÎŞ'ê û di sala 2015'an de jî li ser sînorên Tirkiyê derbasî Sûriyê bûye û tevlî DAÎŞ'ê bûye. Ev kes jî li Cerablûs û Reqayê kar û xebat daye meşandin.

PIŞTGIRIYA DEWLETA TIRK

Ev çeteyên ku di encama operasyonan hatine girtin, bi alîkariya Tirkiyê ji welatên Ewropayê hatine û tevlî DAÎŞ'ê bûne li xwe mukur hatine. Em dizanin ku ev çeteyên ku sûcê mirovahiyê kirine, wek şaneyên biçûk xwe rêxistin dikin û di firsendekî biçûk de amadekariyên komkujiyan dikin. Em dixwazin diyar bikin ku ev şaneyên ku dixwazin gelek komkujiyan pêk bînin beriya bikevin tevgerê ji aliyê operasyona hêzên me de hatine bê bandorkirin. Me berê jî ji raya giştî re ragihandibû ku gelek çeteyên Ewropî û Rojhilata Navîn hatine girtin û gelek ji wan jî hatine bê bandorkirin. Têkoşîna ku em bi biryardariyek mezin dikin wê berdewam bike û wê encamên wê jî ji gelê me û raya giştî re were parvekirin."

YPG'ê li Efrînê derbên giran li çeteyan xist

YPG'ê ragihand ku 9-10'ê Cotmehê li navçeyên Şiyê, Raco û Cindirêsê şervanên YPG'ê derbên xurt li çeteyê DAÎŞ'ê yên dewleta Tirk xistin. Di van çalakiyan de 4 çete hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku 9-10'ê Cotmehê li navçeya Şiyê bi çalakiya sabotajê 2 çete, li Raco çeteyek û li navçeya Cindirêsê jî bi çalakiyeke sekvaniyê çeteyek hatine kuştin.
YPG'ê destnîşan kir ku di çarçoveya pêngava duyemîn a Berxwedana Serdemê li Efrînê hêzên wan çalakiyên xwe yên li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê didomînin. Di dîroka 9 û 10'ê Cotmehê de yekîneyên wan li navçeyên Şiyê, Raco û Cindirêsê rêzeçalakiyên bi bandor pêk anîn. YPG'ê têkildarî çalakiyan ev agahî parve kir:
"Di roja 9'ê Cotmehê de yekîneyek me li gundê Hec Hesna ya girêdayî navçeya Şiyê, li dijî wesayîteke leşkerî ya koma çete ya bi navê Sûltan Mehmed çalakiyek sabotajê pêk anîn. Di encama çalakiyê de 2 çeteyên bi navên Nîhad el Mehmûd û Nîzar el-Idlîbî hatin kuştin.
10'ê Cotmehê yekîneyêk me li gundê Dumiliya ya ser bi navçeya Raco ve li dijî wesayîteke leşkerî ya koma çete ya bi navê el-Mutasim çalakiyek bi bandor pêk anîn. Di encama çalakiyê de çeteyê bi navê Xalid Ebdilla yê ku bi eslê xwe ji Îdlîbê ye hate kuştin.
Di heman rojê de yekîneyêk me li gundê Dêrbelûtê ya ser bi navçeya Cindirêsê ve li dijî koma çete ya bi navê Sûltan Mûrad çalakiyek sekvaniyê pêk anîn. Di encama çalakiyê de çeteyê bi navê Muhened el-Hesen ku bi eslê xwe ji Îdlîbê ye hate kuştin."

Ev sê roje li bajarokê Sûsê şer dijwar e

Di navbera şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û çeteyên DAÎŞ'ê de ku di çarçoveya qonaxa dawî ya Bagera Cizîrê de pêşve diçin li bajarokê Sûsê şer dijwar e.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD'ê ragihand ku di nava kolanên bajarokê Sûsê de şer di navbera şervanên QSD'ê û çeteyên DAÎŞ'ê de giran e.
QSD'ê destnîşan kir ku ji ber ba û bagera li herêmê mesafeya dîtinê pir kêm e, çeteyên DAÎŞ'ê ji vê rewşa hewayê hewl didin sûdê bigirin û êrîşî nuqteyên şervanên QSD'ê bikin.
QSD'ê ragihand li ser bersivdayîna şervanan çete neçar man ku birevin. Bajarokê ku şervanên QSD'ê 10'ê Cotmehê ketînê, şer dewam dike.

Li bakur û başûr 9 leşkerên Tirk hatin kuştin

HPG'ê ragihand di çalakiyên çarçoveya ' Pêngavên Şoreşgerî' yên li Sêrt, Lêlîkan, Çelê, Herêma Barzan û Sîdekanê li dijî dagirkeran hatiye lidarxistin, bi kêmanî 9 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî rêze çalakiyên gerîla yên li dijî artêşa Tirk lidar xistîn daxuyaniyek da. Li gorî daxuyaniya hatiye dayîn bi kêmanî 9 leşker hatine kuştin.
HPG'ê di daxuyaniyê de ev agahî da:
"Hêzên me di çarçoveya pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Egîd de 10'ê Cotmehê li dijî artêşa Tirk çalakiyên xwe didomîne û agahiyên çalakiyan wiha ne:
Hêzên me saet 08:15'an li Girê Lêlîkan ê girêdayî Sîdekan a Başûrê Kurdistanê li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakiyek kirin. Di vê çalakiya ji du baskan ve bi xurtî li çeper û kozikên dijmin hatin xistin de bi qasî hate zelalkirin 4 leşker hatin kuştin.
Hêzên me yên YJA Star saet 14:20'î de li dijî leşkerên li Girê Lêlîkanê bi cih bibûn çalakiyeke ya sekvaniyê kirin û di vê çalakiyê de leşkerek hate kuştin.
Hêzên me saet 19:00'an li dijî leşkerên artêşa Tirk a li girê Xwedê yê li Herêma Barzan a Başûrê Kurdistanê çalakiyeke ya sekvaniyê kirin û di vê çalakiyê de leşkerek hatiye kuştin.
Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de 9'ê Cotmehê saet 10:45'an li dijî leşkerên artêşa Tirk a li Girê Şehîd Canxot ê girêdayî herêma Herekol a Sêrtê çalakiyek kirin. Di vê çalakiya bi xurtî li çeperan hate xistin de 3 leşker hatine kuştin."

Kevana Zêrîn civîna xwe ya salane li dar xist

Tevgera Kevana Zêrîn a Kantona Efrînê bidirûşmeya "Bi hunera azad û çanda dayika xwedawend em ê Efrînê rizgar bikin" civîna xwe ya salane bi beşdariya 300 delegeyan li kampa Serdemê ya Şehbayê li dar xist. Di civînê de xebat hatin nirxandin, plansazî hat derxistin û desteya rêveber a nû ku ji 3 endaman pêk tê hate hilbijartin.

Tevgera Kevana Zêrîn a Kantona Efrînê civîna xwe ya salane li dar xist û desteya rêveber a nû hilbijart.
Tevgera Kevana Zêrîn a Kantona Efrînê bi dirûşmeya "Bi hunera azad û çanda dayika xwedawend em ê Efrînê rizgar bikin" civîna xwe ya salane li kampa Serdemê ya Şehbayê li dar xist.
Hola civînê bi wêneyên têkoşer Barîn Kobanê, Avesta Xabur, Arîn Mîrkan, şehîdên Berxwedana Serdemê, Sakîne Cansîz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylamez hatibûn xemilandin û pankartên "Jin ji bo Efrînê serî hilde" hatibû daliqandin.
Di civînê de 300 delege jê 50 yên rêxistin û saziyên jinan ên kampên Şehbayê amade bûn.
Di civînê de Hevseroka Desteya Çand û Hunerê ya kantona Efrînê Esmehan Ehmed axivî û ev wiha got: "Ya ku dihêle civak parastî be çand, exlaq û huner e. Çanda demokratîk li dijî çand desthilatdar e ya ku sîstema kapîtalîzm û dewletên desthilatdar bi navê pêşketinê ferz dikin. "
Esmehan diyar kir ku gelê Efrînê çanda xwe ya resen diparêze.
Endama Koordînasyona Kongreya Star Eyşa Xeznê bal kişand li ser girîngiya parastina çanda dayika xwedawend di parastina hebûn û nasnameya mirovan de.
Di civînê de rapor û rêziknameya Tevgera Kevana Zêrîn ji aliyê rêvebera tevgerê Dîlan Şêxo ve hatin xwendin.
Di raporê de nirxandinên siyasî, rewşa rêxistinî ya tevgerê û xebatên ku li Efrîn û Şehbayê dane meşandin hatin destnîşankirin, her wiha pilansaziya dema pêş hate derxistin. Nirxandina rewşa siyasî ji aliyê cîgira Hevserokatiya Meclisa Kantona Efrînê Esmehan Mihemed ve hate kirin.
Paşê jî senevîzyoneke derbarê kar û xebatên tevgerê hate nîşandan.
Delegeyan jî di derbarê kar de nirxandinên xwe kirin.
Di civînê desteya rêveber a nû ku ji 3 endaman pêk tê hate hilbijartin.
Axaftina dawî ya civînê ji aliyê endama Meclisa Mabatên Şehîdan a kantona Efrînê Xedîce Elo ve hate kirin. Xedîce di axaftina xwe banga parastina çandê kir…*ANHA*

Festîvalê bi filma 'Keçên Rojê' destpê kir

Sêyemîn Festîvala Navnetewî ya Filman a Silêmaniyê, bi nîşandana filma 'Keçên Rojê' ku behsa tekoşîna jinên Rojavayê Kurdistanê dike destpê kir.
Festîval wê 7 rojan dewam bike, ji 52 welatan bi giştî 122 film û 18 kurte film wê werin nîşandan.
Sêyemîn Festîvala Navnetewî ya Filman a Silêmaniyê, bi nîşandana filma 'Keçên Rojê' ku behsa tekoşîna jinên Rojavayê Kurdisatnê dike destpê kir. Di festîfalê de sînemagerên Kurdistan, welatên herêmê û cîhanê amade bûn û wê festîval 7 rojan dewam bike.
Di destpêka festîvalê de berpirsyarê desteya rêveber a Mekteb siyasiya YNK'ê û rêveberê festîvalê Mele Bextiyar axivî. Bextiyar xêrhatina kesên amade kir û got; "Sînema faktorek ji bo pêşxistina civakê ye."
Piştî wê di festîvalê hûnermend Diyar Qeredaxî berhemên xwe pêşkêşkir.
Di dewama festîlvalê de xelata rêzdariyê ku yekem care di festîfalê de tê dayîn, ji bo hûnermend û sînemagerê Îranî Cehver Penahî hat dayîn. Herwiha sînemagerê Kurd Şewket Emîn û hûnermend Taha Kerîm jî hêjayê xelatan hatin dîtin.
Di festîvalê de senaryoya 'Nîştiman di bajarek şewitî de' wek senaryoya herî baş hat dîtin.
Wê festîval 7 rojan berdewam bike. Di festîvalê de ji 52 welatan bi giştî 122 film tên nîşandan.
Herwiha 18 kurte film jî wê bên nîşandan.
Çalakiyên festîvalê wê li holên Talarî Hûnerî, Siti Senter, Sînema Salim yên bajarê Silêmaniyê di saet 10:00'ê sibehê de destpê bike, heya derengiya şevê dewam bike…*ROJNEWS*

Mîhrîcan diyarî berxwedana Serdemê hate kirin

Çalakiyên Mîhrîcana Osman Sebrî ya duyemîn li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya Qamişlo dest pê kirin. Di mîhrîcanê de hejmareke zêde rewşenbîr, helbestvan ji seranserî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdar bûn. Mîhrîcan diyarî berxwedana Serdemê ya Efrînê hate kirin.
Bi pêşengiya Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya Qamişlo çalakiyên Mîhrîcana Osman Sebrî ya duyemîn dest pê kir. Cîgirê Hevserokatiya Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê Hena Hena axivî û mîhrîcan diyarî berxwedana Serdemê ya Efrînê kir û wiha got: "Armanca me ji vê mîhrîcanê ew e ku çanda resen û çanda biratiya gelan were belav kirin."Hena destnîşan kir ku destkeftiyên fikrî ku li herêmê hatine bi destxistin bi saya fikr û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan e.Piştî axaftinan çalakiyên Mîhrîcanê bi helbestên hin helbestvanên beşdar dest pê kirin. Di Mîhrîcanê de gelek helbestvan ji hemû pêkhateyên Bakurê û Rojhilatê Sûriyê beşdar bûne û berhemên xwe bi zimanên Kurdî, Erebî û Suryanî pêşkêş dikin. Komîteya Amadekar heta niha 19 helbest bi zimanê Kurdî, 25 helbest bi zimanê Erebî; 16 çîrok bi zimanê Kurdî û 22 çîrokên bi zimanê Erebî; 3 gotarên toreyî bi zimanê Kurdî û 9 jî bi zimanê Erebî pêşkêş kirine.
Çalakiyên Mîhrîcana Osman Sebrî ya duyemîn wê sê rojan dewam bike û di rojên yekemîn û duyemîn de berhemên beşdaran ku radestî Komîteya Amadekar kirine wê bêne xwendin û di roja sêyemîn de jî wê navê kesên serkeftî bêne eşkere kirin û wê bêne xelatkirin.

Rêbertiya azad wêneyên azad nîşan dide

Pêşengeha wêneyan a `Rêbertiya azad wêneyên azad nîşan dide` ku di 8'ê Cotmehê de li Silêmaniyê hatibû vekirin, li navçeya Kelar a Germiyan berdewam dike.
Pêşangeha wêneyan a `Rêbertiya azad wêneyên azad nîşan dide` a ku Saziya Çand û Hunerê ya Nuger organîze dike, li Hola Şêwekaran a li avahiya Rêveberiya Hunerî û Rewşenbîrî ya navçeya Kelar a Germiyanê hate vekirin. Ev sê roje ev pêşangehe li navendên cuda berdewam dike.
Di pêşangehê de wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan, gerîlayên HPG'ê, şervanên YPG û YPJ'ê û gelek şehîdên Têkoşîna Azadiyê hatin nîşandan.
Di pêşangehê de tabloyên 5 wênesazan tê nîşandan.
Welatiyan eleqeyek mezin nîşanî pêşangehê dan…*ROJNEWS*

Li Zirganê Navenda Çandê hate vekirin

Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê bi merasîmekê navenda çand û hunerê li bajaroka Zerganê vekir.
Bi dehan şêniyên Zirganê, şandeyek ji Tevgera Çand û Hunerê ya kantona Hesekê, nûnerên Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê beşdarî merasîma vekirina navendê bûn.
Di merasîmê de yek ji rêveberên Desteya Çand û Huner a herêma Cizîrê Nûra El-Wega axivî û diyar kir ku li ser daxwaza rewşenbîr û zarokên herêmê ev navend hate vekirin.
Nûra di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku wê navend alîkariya zarokan bike da ku xwe di aliyê çandî de pêş bixin.
Di dawiyê de komên şano û muzîkê stran û şano pêşkêş kirin…*ANHA*

Şaredarî bi derfetên kêm xizmetê dike

Şaredariyên herêma Cizîrê li gor derfetên xwe yên kêm jî xebatên xizmetê ji bo welatiyan bê navber didomînin. Şaredariya Gel a bajarokê Mergeda ya girêdayî Hesekê tevî ku ev demeke kurte hatiye vekirin, li gorî derfetên xwe gelek projeyên xizmetê pêk aniye.

Şaredariya Gel a Mergeda di demeke kin de gelek proje pêk anîn Şaredariya Gel a bajarokê Mergeda ya girêdayî kantona Hesekê tevî ku ne ji zû ve hatiye vekirin, lê li gorî derfetên xwe gelek projeyên xizmetguzarî pêk aniye. Bajarokê Mergeda di nava çend salên borî de ji ber kiryarên çeteyên DAIŞ`ê gelek zehmetî dîtin. Çeteyên DAIŞ`ê 3 salan bajarok xist bin dagirkeriya xwe. Hemû navendên xizmetguzariyê hatin ruxandin, ji warê xizmetê derketin û çeteyan ji xwe re kirin navend.

Di şerê di navbera çeteyên DAIŞ`ê û şervanên QSD`ê de, çeteyan mal mayin kirin û rûxandin. Her wiha binesaziya bajarok hate hilweşandin û ji ber wê çop li taxên bajarok kom bû. Piştî ku bajarok ji aliyê şervanên QSD`ê ve hate rizgarkirin, jiyan hêdî hêdî li bajarok geş bû. Gelek saziyên sivîl û xizmetguzarî hatin vekirin. Şaredariya bajarok di 10`ê Tebaxa 2018`an de hate vekirin.

Tevî derfetên kêm şaredariyê gelek projeyên xizmetguzarî pêk anî. Bi taybet piştî ku alav ji Desteya Şaredariyan a Kantona Hesekê wergirtin.

Di destpêkê de şaredariyê dest bi rakirina bermahiyên şer ji taxên bajarok kir, her wiha bermahiyên şer ji gundê Keşkeş Cibûr ê ku ji ber şerê li herêmê hilweşiyabû, rakirin. Şaredariyê ji bo ku rê di navbera xelkê gundan, navçeya Şedadê û Hesekê de qut nebe bi awayekî demkî dest bi projeya sererastkirina pirên di xeta rojhilat a 30 kîlometre dûrî navenda bajarok kir.

Niha jî şaredarî stasyona ava vexwarinê ya bajarokê El-Sebhe sererast dike. Ew stasyon wê avê bide bajarokê El-Sor, bajarokê Mergeda û navçeya Şedadê. Her wiha rêya di navbera gund û xeta rojhilat de qîr bike.

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarokê Mergeda Elî Hisên diyar kir ku şaredariyê tevî derfetên kêm û alavan jî gelek projeyên ji bo xizmeta welatiyan pêk anîn. Hisên bang li aliyê pêwendîdar kir ku sarîcên avê ji wan re peyde bikin, ji ber ku tenê 3 sarîcên wan hene û bi rêya wan avê didin bajarokê Mergeda û gundewarên wê…*ANHA*

Cotkar amadekariyên çandina zivistanê dikin

Cotkarên herêma El-Kesrat a gundewarên başûrê Reqayê amadekariyên çandina demsala zivistanê dikin.

Herêma El-Kesrat yek ji herêmên girîng yên çandiniyê li bajarê Reqayê ye û çavkaniya debara jiyanê ya gelê Reqayê ye. Ji ber ku pirraniya şêniyên herêmê debara xwe bi çandiniyê dikin. Herêma El-Kesrat bi çandina hemû cureyên sebzeyan navdar e. Qadên çandiniyê li herêma El-Kesrat zêdetirî 15 hezar donim e û pirraniya wan zeviyan bi rêya çemê Firatê tê avdan.

Herêma El-Kesrat pêdiviyên tevahiya herêma Reqayê û hin herêmên din yên bakurê Sûriyê yên sebzeyên zivistanê bi cih tîne. Têkildarî mijarê cotkarê ji gundê Kesrat Ferec, Xelîl Selûm wiha got: "Îro em zeviyên xwe ji bo demsala zivistanê ji nû ve cot dikin û amade dikin. Hindek cureyên sebze wekî xiyar û bacanên sor ku serma û seqemê tehemul nakin, ji ber wê em di serayan de diçînin."…*ANHA*

Li her derê mirov diçin serdana Mem û Zîn

Mirovên ku li Cizîrê diçin serdana tirba Mem û Zîn, piştî ku çîroka wan dixwînin dua dikin. Yek ji destanên neteweyî yên gelê Kurd, destana Mem û Zîn e. Çîroka eşqa Mem û Zîn ku di navbera salên 1450-51'ê de li Cizîrê deng veda, ji aliyê Ehmedê Xanî ve 240 sal piştî mirina wan bi rengekî helbestî hate nivîsandin. Rastî, başî, bêgunehî, qelsî û bêçaretî di şexsê Mem û Zîn de, nebaşî, durûtî, fitne û fesadî jî di karakterê Beko de vegot.

Li ser vê eşqa mezin ku beriya niha bi 558 salan li taxa Sûrê ya Cizîra Botan rû da, gelek stran hatin gotin, fîlm li ser hate çêkirin û çîrok hatin gotin. Tirba Mem û Zîn a li vê derê ji bo mirovan bûye ziyaretgehek.

Sedanên ji bo tirbê bi sedan salane dewam dikin. Hinek dibêjin, 'Dibe ku ji bo xatirê her du evîndaran duaya min bê qebûlkirin" û tên serdanê. Tirba li Cizîrê, sala 2016'an ji ber qedexeya ku ji aliyê dewleta Tirk ve hate ragihandin û êrîşên hatin kirin, gelekî zerar dît. Şêniyên herêmê alîkarî dan hev û ziyaretgeh ji nû ve vekirin. Ji Colemêrgê heta gelek bajarên Tirkiyê gelek mirov tên serdana tirbê.

Mahmût Kanmaz ku 12 sal in bê berdêl li ber tirbê nobedar e, ji serdanan gelekî kêfxweş e. Kanmaz diyar kir ku ji ber xwedîderketina gelê Kurd a li Mem û Zîn, ziyaretgeh hîn heye û gut, "Rojê herî kêm 50 kes tên serdanê. Mirovên ji vê herêmê roja Pênçşemê tên, dua dikin û diçin. Hejmara mirovên ji bajarên din tên gelekî zêde ye. Me ev der ji bo kesî nekir cihê rantê. Em dixwazin gel bi hêsanî û bê berdêl bê vê derê."Nefîse Çoban ku ji Colemêrgê hatiye serdana keça xwe ya li Cizîrê got, "Zarok ji keça min re çênabe. Min ji bo wê dua kir. Înşalleh wê bê qebûlkirin. Van mirovan li vê dinyayê timî êş kişandin. Dibe ku Xwedê ji bo xatirê wan dengê me bibihîze."

RAMANÊ RÊBERTIYÊ

Neteweya Demokratîk -5-

Abdulah Ocalan

Mirov dikare van nîşane û îşaretan zêdetir bike. Ev jî dide xuyakirin ku hevjiyana bi jinê re pêdiviya xwe bi awayekî eşkere û bi lez bi veguherîneke bingehîn heye. Bi jina bêparastin û bûye milk hevjiyana azad ne pêkan e. Ji aliyê exlaqî ve jî ev yek ne pêkan e. Ji ber ku kengî exlaq tê tinekirin koletî dikare pêk bê. Hemin em nikarin ji exlaqê hêzên hegemonîk re exlaq bibêjin. Hêza hegemonîk, di vê navberê de mêrtiya hegemonîk bi tenê bi hilweşîna exlaqê civakî re dikare pêk bê. Li gorî ku jiyan bê jin nabe, ji bo rizgarkirina jiyanê rizgariya jinê ferz dibe. Berevajiyê vê rastiyê jî rast e, bê mêr jî jiyan dibe, lê ew jiyan jî bi koletî dibe. Ev vegotina me zêdetir der barê wê jinê de ye ku di nava avahiya civakî de ye. Pirsgirêka jinê di nava cîhana zêhniyetê û têkiliya wê de girîngtir dibe. Heta zêhniyeteke dijberê nîşaneyên neyênî yên der barê jinê de bi awayekî serketî pêk neyê, bi gişt hevaltî (bihevrebûn), bi taybetî jî hevaltiya jiyana azad (bihevrebûna jiyana azad) pêk nayê. Ango weke teza dijber ji bo jiyaneke di asta hevaltiya azad a bi jinê re erkên divê bêne bicihanîn xulase mirov dikare wisa rêz bike:

a- Beriya her tiştî pêdivî bi têgîneke hevjiyana ekolojîk heye ku di bingehê wê de pirrbûn û dewamkirina zurriyetê tineye, li gorî îdeala mirovatiyê ya gerdûnî ye, û hebûna zindiyên din jî li ber çavan digire. Asta gerdûnî ya civak gihiştiyê jiyaneke azad bi jinê re ferz dike. Sosyalîzma rastî bi tenê dikare li ser bingehê jiyaneke azad bi jinê re bê avakirin. Ya sosyalîzm divê pêşî bike (ne ya paşî) ew e, divê ji sedî sed jiyana azad bi jinê re bigihîne astekê.

b- Ji bo vê jî divê mirov bi awayekî zêhnî û sazî li dijî desthilatdariya hegemonîk a mêrê serwer têbikoşe, û di asta hevaltî û bihevrebûna azad de serketina têkoşîna zêhniyet û sazîbûnê misoger bike. Bêyî vê serketinê mirov nikare hevjiyana azad pêk bîne.

c- Jiyana bi jinê re divê ti carî weke cinsiyetparêziyeke ji bo dewamkirina xerîzeya cinsî û temendirêjiyê neyê şîrovekirinê. Çi şaristanî, çi jî modernîteya kapîtalîst jiyana cinsiyetparêz a civakî gihandine asteke xeternak û heta ev jiyana cinsiyetparêz di tevahiya qadên zêhnî û sazî de neyê tesfîyekirin, bicihanîna hevjiyana azad ne pêkan e. Di nava paradîgma û wan saziyan de ku jinê weke diyardeyeke milk û objeyeke cinsî dibînin, jiyan ne bi tenê bêexlaqiyeke mezin e, di heman demê de şêwazê jiyanê yê herî şaş û kirêt e. Di nava van şert û mercan de mînakeke din a diyardeya civakî nîne ku evqasî jinekê yan jî mêrekî piçûk bixîne û birizîne.

d- Kengî milkkirina jinê hat redkirin, ji cinsiyetparêziya civakî ya tê bikaranîn bi temamî bê bihurîn, di her asta civakî de wekhevî (li ser bingehê cudatiyê wekhevî) pêk hat, hevjiyana azad bi jinê re pêkan e.

e- Kengî jin ji bo dewamkirina zurriyetê nebe amûr, nebe karker an jî bêkar, nebe karkereke erzan an jî bêheqdest, di her qadê de nebe meta bibe kirdar, hevjiyana azad pêre pêkan e.

f- Civak bi tenê di van şert û mercan de dikare li gorî hevjiyaneke azad be ango dikare ber bi civaka azad û ya xwedî şertên wekhev biberide.

g- Di nava şert û mercên erênî de hevjiyana azad bi jin û mêrên nirxê xwe yê mejî û avabûnê zêdekirî re pêkan e.

Civaka li Rojava li dora Ocalan bûye yek

Heyetek ji 7 endamên Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Enternasyonalîst serdana Rojava kir. Yek ji endamên heyetê, Berdevka Femînîst a Spanya Madrîdê Consûelo Nûnez diyar kir ku dewleta Tirk êşkence û zilmeke giran li gelê li Efrînê dike û got, "Divê em ji hêviya vegerê ya gelê Efrînê re bibin bersiv."

Ji Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Enternasyonalîst Consûela Nûnez serdana Rojava kir û got, "Civaka li vê derê li dora felsefeya Ocalan bûye yek."

Heyetek ji 7 endamên Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Enternasyonalîst serdana Rojava kir. Yek ji endamên heyetê, Berdevka Femînîst a Spanya Madrîdê Consûelo Nûnez e. Nûnez bal kişand ser binpêkirina mafên mirovan ku dewleta Tirk bi serkêşiya Serokkomarê Tirk Tayyîp Erdogan dike û qala zor û zehmetiyên gel ên piştî dagirkirina Efrînê kir.

Nûnez diyar kir ku dewleta Tirk êşkence û zilmeke giran li gelê li Efrînê dike û got, "Divê em ji hêviya vegerê ya gelê Efrînê re bibin bersiv. Malbat ji hev hatine dûrxistin. Dayik, bav, zarok ji hev hatine qutkirin. Nikarin xwe lê ragirin ku malbat bi hev re bijîn. Ji ber vê yekê divê em bibin bersiv ji bangên dayikên Efrînî re."

Consûela Nûnez ji bo tiştên ku di dema serdana Rojava de herî zêde bandor lê kirin got, "Dema ku me Şoreşa Rojava bihîst, gelekî bala me kişandibû. Min hin nivîs bi Spanî wergerand û belgesel amade kir. Bi taybetî di pêvajoya Efrînê de em bi rengekî aktîf li ser piyan bûn. Mijara ku herî zêde bandor li min kir; berxwedana azadiya jinê bû. Di serdana vir de min dît bê civak bi çi rengî li dora felsefeya Rêber Apo li hev civiya ye û çawa yekîtiya xwe ava kiriye. Min fêhm kir bê li Ewropayê civak çawa parçe bûye û nêzîkatiyên takekesî li pêşiya civakîbûn û hevgirtinê çiqasî asteng e."

EZ BI KEÇA XWE SERBILIND IM

Consûela Nûnez di dema serdana xwe de jin û malbatên Efrînî jî dît û got, "Gel bi zorê ji cih û warê xwe hatiye derxistin. Erdogan jî bi bahaneya penaberan pereyan ji dewletên derve distîne. Dixwaze bibe endamê Yekîtiya Ewropayê. Lê belê mafên mirovan timî binpêdike."

Consûela Nûnez da xuyakirin ku keça wê weke kedkareke çapemeniyê dema ku bûyerên li Bakurê Kurdistanê dişopand, berxwedana gelê Kurd û têkoşîna azadiyê ya jinê nas kir û tevlî nava Berxwedana Rojava bû. Nûnez got, "Keça min piştî ku berxwedana Kurdan û têkoşîna azadiyê ya jinan nas kir, jê hez kir. Dema ku got ku dixwaze bê Rojava, weke dayikekê tirs ketibû dilê min bê wê çawa di nava şer de karibe bimîne. Lê belê piştre ez hatim û min dît ku gelekî kêfxweş e û wateya jiyana xwe dîtiye. Ez bi vê yekê serbilind im. Û min jî biryar da ku bidim ser şopa keça xwe."

Jinên Dêrazorê xwe bi rêxistin dikin

Meclisa Jinan a Dêrazorê ji bo birêxistinkirin û perwerdekirina jinan navenda Meclisa Jinan li navçeya El-Bisêra a gundewarên rojhilatê Dêrazorê vekir.

Di merasîmê vekirina navendê de nûnerên Meclisa Sivîl a Dêrazorê, Meclisa Sûriya Demokratîk, Mala Jin a Dêrazorê, şêx û rûspiyên Êla El-Begara û Îgêdat li herêmê û di dehan şêniyên herêma El-Bisêra amade bûn.

Di merasîma vekirina navendê de Hevseroka Meclisa Sivîl a Dêrazorê Leyla Hesen û Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Wefa Celal axivîn.

Kesên axivîn vekirina navendê pîrozkirin û hate gotin ku jin bingeha avakirina civakan e, lewra pêwîst e, rola wî ya di pêşengiya civakê de were xurtkirin.

Navevd ji aliyê endamên Meclisa Malbatên Şehîdan ve hate vekirin…*ANHA*

Divê jin li dijî tecrîdê têkoşînê bidin

Hevberdevka Delegeyên KCD'ê Zelal Bîlgîn diyar kir tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewama komploya navdewletî ye. Hevberdevka Delegeyên Kongreya Civaka Demokartîk (KCD) Zelal Bîlgîn tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxand û diyar kir ku tecrîdkirina Ocalan pêşî li qirkirinê vedike û polîtîkayên şer kûr dike. Bîlgîn îşaret li bandora tecrîdê ya li ser tevahiya Rojhilata Navîn kir û got, "Ne tenê Kurd hatine tecrîdkirin, tecrîdê sînorên Îmraliyê debas kiriye. Tecrîd îzolasyon e û tê wê wateyê ku mirov nikare bi kesî re têkiliyê deynin. Ev jî rêbazeke êşkenceya herî giran e. Ev biryar li qanûnan nayê. Bi vê yekê re dixwazin têkiliya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi gel re qut bikin û ramanê wî ji holê rakin."

TECRÎD DEWAMA KOMPLOYÊ YE

Bîlgîn destnîşan kir ku tecrîd dewama komploya navnetewyeî ye û wiha pê daket: "Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di pêvajoya aştiyê de bi ramanên xwe bandorek mezin li gelê Tirkiyeyê kir. Hikumetê jî li xwe mikur hat ku fikrên Ocalan bandor li wan jî kiriye. Lê belê niha hemû têkiliyên Birêz Ocalan ên bi derve re hatine qutkirin û dixwazin qirkirinekê pêk bînin. Ev jî dewama komploya navneteweyî ye. Heta tecrîd ranebe, wê dawî li vî şerî neyê û ji aliyê siyasî ve pêşketinek bidomînin."

Elîf Henan diyar kir ku berî êrîşên dewleta tirk û komên girêdayî wê Efrîn cihekî ewle bû û got: "Berî ku dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê êrîşî Efrînê bikin hemû kes di nava wekheviyê û aramiyê de dijiyan lê niha li Efrînê her cure zilm û şîddet tê kirin. Li wir pergala zilmê hatiye avakirin. Lê em ê bi têkoşîna xwe dawî li vê pergala zilmê bînin."

Emîne Murad diyarkir ku ew ê li dijî pergala tunekirin û dagirkeriyê berxwedana xwe bidomînin û got: "Bi darê zorê Erdogan Efrîn dagir kir û zarok qetil kir. Lê bila ew baş bizanibe ku em Efrînê ji dagirkeran re nahêlin. Em ê Efrînê rizgar bikin."

Semiya Îbrahîm jî destnîşan kir ku Efrîn a Efrîniyan e û got: "Efrîn bi xwîna şehîdên me hatiye avdan. Em ê dev ji bo têkoşîna azadiya Efrîna xwe bernedin. Tu carî me hêviya xwe winda nekir. Heta Efrîn rizgar nebe em ê dev ji berxwedana xwe bernedin. Efrîn axa me ye ne ya dagirkeran. Têkoşîna me ya li dijî dagirkerî û faşîzmê wê her dem bidome. Em bêdengiya rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî jî şermezar dikin. Divê ew jî erka xwe bi cih bînin."…*JINNEWS*

Dewleta Tirk bi navên cuda alikariya bi DAIŞ'ê didomîne

Endama Rêveberiya Ewlekariya Navxweyî ya Minbicê Rîm El Elî diyar kir ku têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê xizmeta ji bo mirovatiyê ye û got: "Têkoşîna me ya li dijî DAÎŞ'ê didome."

Piştî ku Minbic ji destên çeteyên DAÎŞ'ê hat rizgarkirin şûnde jiyanek aram û ewle dest pê kir. Piştî rizgariyê jî têkoşîna li dijî çeteyan dewam kir. Endama Rêveberiya Ewlekariya Navxweyî ya Minbicê Rîm El Elî anî ziman ku ji bo zincîra koletiyê bişkê wan gelek têkoşîn dane û diyar kir ku ev têkoşîn wê tu carî bi dawî nebe. Rîm diyar kir ku DAÎŞ'ê hem jin wekî kole bi kar dianî hem jî karê sîxurtiyê dikir û got: "Niha şopa kiryarên DAÎŞ'ê yên qirêj hîn xuya dike. DAÎŞ'ê heşîş, fûhûş di nava civakê de belav dikir û sîxurtî li ser mirovan ferz dikir. Ji bo ewlehiya Minbicê têkoşîna me ya li dijî van kiryaranan didome. Ji bo civak ji rastiya xwe dûr bikeve û bê çewisandin DAÎŞ'ê jin wekî kole bi kar dianîn. Em ê her xwe li dijî kiryarên qirêj biparêzin."

Rîm bal kişand ser têkoşîna hevpar û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Yên ku alîkariya DAÎŞ'ê dikir dewleta tirk bû. Niha jî vê alîkariya bi navê komên din dewam dike. Em ê wekî jin û gelê Minbicê têkoşîna xwe mezin bikin. Têkoşîna me ya li dijî DAÎŞ'ê didome. Ji bo zincîra koletiyê bê şikandin divê têkoşîn tu carî bi dawî nebe. Têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê xizmeta ji bo mirovatiyê ye."…*JINNEWS*

Efrîn ya Efrîniyan e ne ya dagirkeran e

Jinên Efrînê yên li navçeya Til Rifetê ya Şehbayê bi cih bûne bêdengiya rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî şermezar kirin û gotin: "Tu carî me hêviya xwe winda nekir. Heta Efrîn rizgar nebe em ê dev ji berxwedana xwe bernedin. Efrîn axa me ye ne ya dagirkeran e."

Jinên Efrînê yên li navçeya Til Rifetê ya girêdayî Kantona Şehbayê bi cih bûne diyar kirin ku têkoşîna wan a li dijî dagirkerî û faşîzmê didome û dan zan'n ew ê teqez rojekê vegerin Efrînê.

Jina bi navê Sewliyê Ehmed Bekir diyar kir ku ew ê heta dawî li dijî hemû êrîşan xwe biparêzin û got: "Dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê êrîşî me kir, malên me talan kirin. Li ser keda destên me rûniştin. Erdogan bi hezaran mirovên sîvîl qetil kir. Zarok qetil kir. Em ê li dijî vê dagirkeriyê têkoşîna xwe bidomînin."

Elîf Henan diyar kir ku berî êrîşên dewleta tirk û komên girêdayî wê Efrîn cihekî ewle bû û got: "Berî ku dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê êrîşî Efrînê bikin hemû kes di nava wekheviyê û aramiyê de dijiyan lê niha li Efrînê her cure zilm û şîddet tê kirin. Li wir pergala zilmê hatiye avakirin. Lê em ê bi têkoşîna xwe dawî li vê pergala zilmê bînin."

Emîne Murad diyarkir ku ew ê li dijî pergala tunekirin û dagirkeriyê berxwedana xwe bidomînin û got: "Bi darê zorê Erdogan Efrîn dagir

Di her kes li ber tecrîdê rabe

Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan, destnîşan kir ku rewşa Îmraliyê tecrîd derbas kiriye û diyar ku biryara DMME'yê ya derbare Ocalan de biryareke siyasî ye. Mihemed Ocalan bang li hemû saziyên navnetewî yên mafên mirovan û kesên demokrat kir ku ji bo rakirina tecrîdê bikevin nava tevgerê.

Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan, destnîşan kir ku rewşa Îmraliyê tecrîd derbas kiriye û diyar ku biryara DMME'yê ya derbare Ocalan de biryareke siyasî ye.
Ji sala 2011'an ve êşkençeyeke sîstematîk a bênavber li Îmraliyê li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk tê. Ji meha Îlonê ya 2016'an ve jî agahî jê nayê girtin. Birayê Rêber Ocalan, Mihemed Ocalan diyar kir ku rewşa li Îmraliyê tecrîd derbas kiriye.
Mehmet Ocalan di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku malbat, parêzer û şandeya Îmraliyê ji ber tecrîda li ser Rêber Ocalan tu agahiyên rasterast jê nagirin û wiha got: "Li gorî qanûnan ew mafê hikumxwarekî heye ku hevdîtinê bi malbat û parêzerên xwe re bike. Lê vê qanûnê ne ji bo malbat û ne jî ji bo parêzerên wî pêk tînin. Ev 3 sal e bi tu awayî ji birayê xwe agahiyekê nastînim. Gelo dijî yan najî, em nizanin. Vê rewşê êdî tecrîd jî derbas kiriye. Mînakeke din a vê rewşê li tu deverên cîhanê tune ye.Tecrîd li ser hebûna girtiyan çêdibe. Ev ne tecrîd e. Ev 3 sal e nahêlin em bi serok re hevdîtinê bikin. Rojane hincetan ava dikin. Ew hincetên wan ne rast in û nayên qebûlkirin. Dewleta Tirk li dijî hiqûqê tev digere. Divê parêzer, malbat û heyet bi serokatî re hevdîtinê bikin. Ev mafê wî yê herî hiqûqî ye. Pêwîst e deriyê Îmraliyê were vekirin û em bi serokatî re hevdîtinê bikin."
Derbarê biryara DMME'yê de ku diyar kiribû ku "têra xwe delîl tune ne" ku îşkence li Ocalan hatiye kirin de Mihemed Ocalan diyar kir ew biryar li dijî rastiyê ye û wiha dewam kir:"Heke hiqûq ji bo hemû kesan derbasdar be, pêwîst e ji serok û hevalên wî jî derbasdar be. Hiqûqa DMME û CPT'yê li Îmraliyê nayê meşandin. Biryara DMME'yê ne hiqûqî ye, siyasî ye. Hevdîtîn ev 3 sal e nayê kirin. Gelo DMME çima wê li ber çavan nagire?."
Mihemed Ocalan da zanîn ku dewletên Ewropayê di sala 1998'an de deriyên xwe li Rêber Ocalan girtin û wiha got: "Heke em wê bînin ber çavan, diyar e ku Ewropa li gorî berjewendiyên xwe tev digere. Li ser parçekirina Kurdan berjewendiyên xwe dixwaze bi kar bînin. Ewropa naxwaze pirsgirêka Kurd bi demokrasiyê çareser bibe. Ji bo wê jî biryara DMME'yê siyasî ye."
Mehmet Ocalan destnîşan kir ku tecrîda li ser Rêber Ocalan li ser gelên rojhilatanavîn jî tê meşandin û wiha got: "Giraniya serok di Rojhilata Navîn de heye. Dewleta Tirk naxwaze pirsgirêka gelê Kurd were çareserkirin. Ji bo wê jî tecrîda herî giran li ser serokatî dide meşandin."
Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan di dawiya axaftina xwe de bang li hemû saziyên cîhanê û kesên demokrat kir ku ji bo rakirina tecrîdê bikevin nava liv û tevgerê û wiha got: "Serok dixwaze di Rojhilata Navîn de aştî pêk werê. Li hemberî wê divê kes nesekine. Divê demildest tecrîda li ser serok bê rakirin. Pirsgirêka gelê Kurd û Rojhilata Navîn bi azadiya serok wê werin çareserkirin."…*ANHA*

Erdogan îxbar dike, dozger û polîs jî pêk tînin

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku operasyona li dijî partiya wan amadekariya li dijî hilbijartinê ye û got: "Em dizanin kê îxbar kiriye. Erdogan her roj îxbar dike. Di destê wan de delîl nîne, lewra sûcek li holê tune ye."
Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî û heyeta pê re ji bo li dijî operasyona li dijî rojnameger û siyasetmedaran derkeve çû Amedê. Temellî û heyeta pê re li avahiya Rêxistina HDP'ê ya Amedê civîna çapameniyê li dar xist û bal kişand ser binçavkirina endam û rêveberên partiya xwe û rojnamegeran.
Temellî destnîşan kir ku ew operasyonan wek binçavkirinan nanirxînin û got: "Ez raya giştî ya Tirkiyê li dijî van operasyonan vedixwînim hestiyariyê. Hevalên me bi rêbazên herî hov tên binçavkirin. Sehneyên binçavkirinê desthilatdarî dixwaze Tirkiye çawa xeyalî ava bike nîşanî me dide. Bi şikandina deriyan dikevin malan. Tu hovîtiyek wisa nayê qebûlkirin. Bi şikandina deriyan dixwazin peyam bidin civakê. Ev dozgerek çawa ye. Dema fermana binçavkirinê dide fermana derî şikandinê jî dide. Tenê fermana şikandina derî nade, di heman demê fermana pêkanîna tundiyê û çekan bixin serê zarokan û mezinan jî dide. Tu forsa xwe li kî dikî dozger? Bi van kirinên we wê kes bêzar nabe. Tu kes wê dev ji têkoşîn û sekna xwe bernede. Hûn bi van kirinan xwe rezîl dikin."
Temellî bal kişand ser derbkirin û îşkenceya di dema serdegirtina malan de û wiha dewam kir: "Derb kirin û îşkecence kirin heye. Muameleya xerab a li dijî zarokan heye. Hişê mirov van pêkanînan nagire. Destên Derya Aslan berevajî kelepçe kirin e û bi kêrê vekirine. Hevala me bi kêrê birîndar kirin e. Dema diçin mala hevaşaredara me Gulay Ozavci ku hevjînê wê binçav bikin, pê li pişta hevala me dikin. Destûr nadin ku cilên xwe yê rojê li xwe bike. Bi van pêkanînan hevalên me binçav dikin. Ev ehlaqek çawa ye. Li dijî jinan tundiyê pêk tînin û em dizanin ji ber ku HDP partiya jinan e vê şidetê dikin."
Temellî diyar kir ku operasyona binçavkirinê li dijî hilbijartinên herêmî ye û wiha dewam kir: "Ev tiştên niha diqewimin berê jî gellek caran hat serê me. Beriya hilbijartina 24'ê Hezîranê tifaqa AKP û MHP'ê kampanyaya hilbijartinê bi heman rêbazan birêve bir. Bi desteka walî, qeyûm, qeymeqam, esker, polîs, dozger û dadgeran li dijî gelê me û endam û rêveberên me zextan û tundiyê dikin. Kampanya xwe ya êrîşan dane destpêkirin. Bi zimanê tehdîdkar ê Erdogan tundiyê û binçavkirinan dest pê kir."
Temellî da zanîn ku ew ê kampanya "Siyaseta Demokratîk" bidin destpêkirin û wiha got: "Em ê bi tevahiya gelê xwe re kampanya demokrasî û aştiyê bidin destpêkirin. Ev kampanya li dijî tundiyê, zext, êrîş, qeyûman, yên dixwazin siyaseta demokratîk tasfiye bikin hat destpêkirin. Em bang li hemû gelên Tirkiyê, jinan, kedkaran dikin û em dibêjin werin em hemû bi hev re vî aqlî li dijî siyaseta demokratik rawestînin."
Temellî bang kir ku bila siyasetmedar û rojnameger bên berdan û got: "Yên ku li edaletê xwedî derkevin tenê ne gel e, di heman demê de dadgehin jî."
Temellî pişt re pirsên rojnamegeran jî bersivand û got yên hatine binçavkirin kesên dê namzet bên nîşandan nînin û hê pêvajoya wan a namzet nîşandanê dest pê nekiriye. Temellî anî ziman ku siyasetmedarên di binçavan de xebatên hilbijartina 24'ê Hezîranê birêve binin e û got: "Sûcdarkirin, sûcdariyek lêanîne. Feraseta ku nikare serkeftina HDP'ê têk bibe, bi awayek hov û tund bi ser partiya me ve tên."

EM DIZANIN KU ERDOGAN ÎXBAR KIRIYE

Temellî bersiva pirsa derbarê "îxbara bênav" di lêpirsînê de cih digire da û got: "Em dizanin kî îxbar kiriye. Erdogan her roj îxbar dike. Bi zimanek êrîşkar û nefrete diaxive. Tîne ziman ku partiya me rewa nabîne. Me baş îfade kir ku meseleya rewabûnê li ku tê nîqaşkirin. Divê Erdogan bi encamek çawa ji hilbijartina 24'ê hezîranê derket rewabûnê bide destpêkirin. Bi hîleyan û YSK'ê jî kir şirîkê xwe û bê rewabûna herî mezin pêk tîne. Rewabûna wan li holê ye. Hilbijartina herêmî nêz dibe û serî li rêbazên zext û êrîşkariyê didin."
'Temellî îxbara hatiye kirin wek "lêanînê" nirxand û got: "Lîsteya îxbaran û navê îxbar nîne. Henekê xwe bi mirovan dikin. Senaryo û fezlekên li hev anîne. Dixwazin civakê bitirsînin û taktîkên derûniya şer dixin dewrê. Berê jî van rêbazan gellek bikar anîn. Niha jî gellek hevalên me bi van dek û dolabên wan di girtîgehan de ne. Hevalên me li ser şahidên sexte û şahidên nepen girtî ne. Ev operasyon bi temamî li hev anîne. Di destê wan de delîl nîne. Belge jî nînin. Lewre li holê sûcek nîne."

Ocalan bi têkoşîna xwe komplo têk bir

Siyasetmedarên navçeya Girkê Legê destnîşan kir ku têkoşîn û berxwedna Ocalan komplo têk bir.
Siyasetmedarên Kurd ên navçeya Girkê Legê derbarê salvegera komployê de axivî û diyar kirin ku bi tecrîdkirina Rêber Ocalan ruyê faşîst yê dewleta Tirk hê zêde eşkere dibe.
Siyasetmaderê Kurd Mistefa Mam Xêr diyar kir dewleta Tirk bi tecrîdkirina Ocalan, hewl dide fikrên Ocalan negihîjin gelên bindest.Mistefa destnîşan kir ku destkeftiyên ku li herêmên Bakurê Sûriyê hatine bidestxistin bi saya fikrên Ocalan ên li ser bingeha neteweya demokratîk û biratiya gelan in. Mistefa got: "têkoşîna bi fikrên Ocalan komplo têk bir. Azadiya Ocalan tê wateya azadiya gelên bindest û belavkirina demokrasiyê di nav gelan de."
Siyasetmedar Ebdulhadî Ehmed diyar kir ku tecrîd polîtîkayeke faşîst a dewleta Tirk e û bi tecrîdê dixwaze kurdan ji tekoşînê dûr bixe û qir bike.
Ebdulhadî Ehmed da zanîn ku gelê Kurd û hemû gelên Kurdistanê li hemberî siyaseta qirkirinê têkoşînê dikin.
Siyasetmedar Hisên Osman jî destnîşan kir dewleta Tirk ji bo ku Ocalan ji gel dûr bixe tecrîda giran ferz dike.
Osman got: "Ev siyaseta tecrîdê têkçûna dewleta Tirk a li rojhilatanavîn û cîhanê nîşan dide."…*ANHA*



Ji bo Ocalan gel dadikeve qadan

Roja 13'ê Cotmehê li seranserî welatên Ewropa yê gel ji bo şermezar kirina komploya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêber Ocalan dadikeve qadan. Dîwana Hevserokatiya KCDK-E û TJK-E'yê têkildarî meş û çalakiyên li dijî Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê daxuyaniyek da û banga tevlêbûna çalakiyankirin.

KCDK-E – TJK-E bal kişand ku Komploya 9'ê Cotmehê û tecrîd bi berxwedanê wê bê şikandin û dîroka çalakî û meşên girseyî yên li welatên cuda bên kirin eşkere kir.
Dîwana Hevserokatiya KCDK-E û Tevgera Jinên Kurd ên Ewropa (TJK-E) têkildarî meş û çalakiyên ji bo protestokirin û şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê daxuyaniyek da.
Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Hêzên ku Komploya 9'ê Cotmehê pêk anîn, dixwestin Tevgera Azadiya Kurd û têkoşîna azadî û wekheviyê ya li Rojhilata Navîn bikin hedef. Di serî de berxwedana Dîrokî ya Rêber Apo ya li Îmralî û berxwedana gelê Kurd ev konseptê vala derxist."
Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku tevî komplo û tecrîdê jî pradîgmaya Ocalan ji bo gelên Kurdistan û Rojhilata Navîn bûye hêviya jiyanê û ev tişt hate gotin: "Her ku diçe ev felsefe nava gelan de belav dibe û dibe sedemê aciziya dewleta Tirk a faşîst û serweran. Ji ber vê tecrîd û êrîşên dorfîreh dikin. Di serî de ev tecrîd wê bi berxwedana jin, ciwan hemû gelê Kurd û mirovên pêşverû wê bê şikandin."
KCDK-E û TJK-E ev bang kir: "Ji bo şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê û azadiya Rêber Apo bi awayekî pirr xurt tevlî meş û çalakiyên 13'ê Cotmehê bê kirin bibin.
Ji bo qîrkirina azadiya Rêber Apo û ketina tevgerê ya saziyên navneteweyî bang li hemû gelê xwe yên li çar parçeyan; şoreşger, demokrat, rewşenbîr û parêzvanên mafê mirovan dikin ku bi girseyî tevlî çalakiyan bibin û xwedî li Rêber Apo derbikevin."

NPG'ê ji bo çalakiya li Çelê gêrîla pîroz kir

Fermandariya Biryargeha Navendî ya Parastina Gel li ser çalakiya gerîla ya li Çelê ku 6 leşkerên Tirk hatin kuştin, daxuyanî da.
Di daxuyaniya Fermandariya Biryargeha Navendî ya Parastina Gel de ya bi sernavê ''Ji bo Fermandarîya Eyaleta Zapê' gerîlayên ku ev çalakî kirine hatin pîrozkirin.
Daxuyanî wiha ye:
''Çalakiya we ya 9'ê Cotmehê ya li Başûrê Kurdistanê li ser Girê Koordînê ya li dijî hêzên dagirker ên mêtingeriya Tirk, bi mebesta şermezarkirina Komloya Navdewletî ya 9'ê Cotmehê çalakiyeke encamgir û serkeftî ye. Ji ber vê çalakiya ku bi taktîk û performansa teknîk a encamgir em fermandariya we, di şexsê fermandariya we de hêzên eyaletê yên Zapê û vê yekîneya ku ev çalakî pêk anî, ji ber vê serkeftina girîng pîroz dikin, hêviya berdewamiya serkeftinê dikin.
Di vê serdema girîng de ya dîroka têkoşîna me, em bawer dikin ku hêzên me yên eyaletê wê serkeftinên mezintir pêk bînin, bi vê baweriyê em we û hêzên eyaletê bi hezkirin û hurmetê slav dikin, serketinê mezin dixwazin.''

Pêngava Bagera Cizîrê: 38 çete hatin kuştin

QSD'ê ragihand ku di çarçoveya qonaxa dawîn a pêngava Bagera Cizîrê ya "Şerê Tinekirina Terorê" de 38 çete hatin kuştin û 11 bargehên wan hatin rûxandin.
Navenda Ragihandin û Çapemiyê ya QSD'ê bi daxuyaniyekê ku li ser malpera xwe ya fermî belav kiribû encamên şerê 24 saetên dawî yê Şerê Tinekirina Terorê aşkera kir.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin:

ENIYA BAXOZ

Di navbera şervanên me û çeteyên DAIŞ'ê de şer derket. Li eniyên pêşîn tevgereke zêde ya çeteyan hebûn,ş ervanên me bi hemû hêza we kirin hedef. Her wiha çeteyan bi topavêjinan navendên şervanan me topbaran kirin. Lê di encama wê de tu zerar di aliyê şervanan me de çênebûn.
Di saetên sibê de jî şervanên me 3 kîlometre pêşde çûn. Di encama wî şerî de gelek çete hatin kuştin. Şervanan 17 nuqteyên xwe ava kirin. Tîmên taybet ên rakirina mayînan 4 mayînên ku ji aliyê çeteyan ve hatibûn bicihkirin hatin bêbandorkirin.
Ji ber rewşa hewayî ya ne baş û zehmetiyên di ditînê de çeteyên DAIŞ'ê xwestin ji vê yekê sûd werbigrin û hewl dan êrîşî nuqteyên QSD'ê bikin lê şervanan êrîşên wan têk birin û di encama wê de 10 çete hatin kuştin. Gelek ji çeteyan jî reviyan. Di heman demê Koalîsyona Navdewletî jî deverên çeteyan topbaran dikirin.

ENIYA HECÎN

Li wê derê şervanên me 1 kîlometre bi pêşde çûn. Piştî ku hejmarek çete kuştin 20 nuqteyên yên nû ava kirin. Her wiha hemû rê û xendeqên çeteyan birîn da ku nikaribin êrîşên dijber pêk bînin.
Çeteyên DAIŞ'ê ji toz û bahozê sûd girtin û êrîş anîn ser nuqeteyên şervanên me, şervanan hemû êrîşan wan şikandin.

ENIYA SÛSÊ

Li bajarokê El-Sûse di navbera şervanên me û çeteyên DAIŞ`ê de şerê dijwar rû da, dîan jî çeteyan xwestin ji rewşa hewayê sûdê bigirin û êrîşên dijber pêk anîn, şervanên bersiva êrîşan dan û êrîş şiandin. Şer li vê eniyên heya niha didome.

ENIYA BEHRE

Çeteyên DAIŞ`ê êrîşên dijwar birin ser navendên şervanan.
Di encama wê de di navbera şervanên me û çeteyên DAIŞ`ê de şerê dijwar rû da. Gelek çete hatin kuştin. Balafirên Koalîsyona Navnetewî du erebeyên bombebkirî teqand û erebeyeke doçka li ser û buldozerek texandin."

2018'an de 56 nûçegihan hatin kuştin

Li tevahiya cîhanê hijmara nûçegihanên ku 9 mehên pêşî yên îsal hatin kuştin, ji ya tevahiya par zêdetir e.
Li gorî Rêxistina Nûçegihanên Sînornenas (RSF) 9 mehên pêşî yên îsal 56 nûçegihan hatine kuştin. Di daxuyaniyê de hate gotin par di 12 mehan de 55 nûçegihan hatibûn kuştin.
Li gorî vê li li Efganîstanê 13, li Yemenê 5 nûçegihan hatine kuştin. Welatên din yên ku nûçegihan pir lê hatine kuştin Pakîstan, Filîstîn û Sûriye ye. Li Sûriyê par 9 nûçegihan dema ku karê xwe dikirin hatin kuştin.
Îsal bi tevahî 29 nûçegihan li qadên şer dema ku li ser karê xwe bûn hatin kuştin.
RSFê diyar kir rêjeya nûçegihanên têne kuştin bi asteke wiha ye ku alarmê dide û bang li civaka navnetewî kir ku bi lezgînî tevdîr werin girtin.
Bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) hate kirin ku bi asta Sekreteriya Giştî nûnerekî taybet were diyarkirin.

Armanc qirkirina Kurda ye

Mihemed SEYDÎ

Êrîşên li ser gelê kurd û projeya ku li Rojavayê Kurdistanê niha pêşengiya wê kurd dikin didomin. Gefên ku yekser ji aliyê Tayib Erdugan ve li ser gelê kurd tên xwarin zêdetir û eşkertir dibin. Erdogan li ser kîjan masê rûdine êrişên li ser gelê kurd û qirkirina wan dixe rojevê.
Ji ber ku projeya wî ya avakirin Qaşo Îmarata Îslamî ya ku DAIŞ'ê serkêşiya wê dikir û di pişt perdê de Serekçete Erdugan û dewlet Tirk dikir bi destê kurdan têk çû û niha li herêma herî dawî ya çeteyên Dewleta Tirk (DAIŞ'ê) şerên tunekirina Terorê tên meşandin.
Her ku li Sûriyê dewleta Tirk û çeteyên wê bi destê kurdan têk diçin ew li bakurê kurdistanê zext û êrişên xwe li ser gel zêde dike. lê dîsa jî Dîn û har bûye û ji bo tenê hincetekê bibîne êrişî bakurê Sûriyê bike her diqilqile.
Di roja 9'ê Cotmehê de operasyona Qirkirina Siyasî jî li ser siyasetvan û rojnamevanên Kurd pêk anî û bi dehan kes dîsa xistin zîndanan.
Li hevkirina Idlibê ya ku bi Rûsiya re çêkir dîsa mijara kurdan û tunekirina wan hebû. Heta ku hin aliyên rewşê dişopînin dibêjin ku wan ji Rûsiya re gotiye ku daxwazê ji Emerîka bikin da ku kurdan 40Km dûrî sînor bixin.
Dîsa li beramberî tawîzên ku li ser Idlibê dan Rûsiya ew bû ku danûstandina di navber Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê û rêjîmê de bi dawî bibe...
Dewleta Tirk ji ber Fubiya kurdan êdî tevlihev bûye û tişt nemaye ku tenê ji bo rê li pêşiya kurdan bigre nedaye derûdorê.
Beriya demekê derdiketin û her digotin ku wan û Emerîka li ser Nexşeriyekê derbarê Minbic de li hevkirin û ew ê dewriyeyan di nava Minbicê de bi Emerîka re bigerînin.. Her bi vê yekê xwe dinepixandin. Lê helwesta Fermandariya Meclisa Leşkerî ya Minbic ku wan bajarê xwe bi xwîna zarokên Minbicê rizgarkirine û ew ê ji bo parastina bajar û gelê xwe hemû tedbîran bigrin bersiv bû.
Li vir dewleta Tirk gefa êrişê dîsa li ser Minbicê xwar. Li hemberî van gef û êrişan hêzên parastina Minbicê tedbîr girtin û bi van tedbîran re pêşî li derewên dewleta Tirk û rayedarên wê yên ku ew nexşerêya bi Emerîka re pêk tînin derxist holê û fitneyên ku dewleta Tirk dikirn têk bir. Pişt vê, yekser raghandina Dewlet AKP'ê li ser navê Erdogan got "wan itifaqa bi Emerîka re li ser Minbicê paşde xistine."
Ev mijar hemû girêdayî êrişên qirkirina gelê kurd û projeya ku kurd pêşengiya wê dikin e ye.
Beriya 2 rojan li ser navê wezareta karê derve ya Rûsiya hate gotin ku hewldanên birina çeteyan ji Idlibê ber bi Îraqê ve heye. Çiqas ev agahî nehatibe piştrastkirin yanî ku tenê wekî axaftin jî hatibe gotin û dîtin jî, lê diyare ku dewleta Tirk tiştekî bi vî rengî ji Rûsiya daxwaz kiriye.
Dewleta Tirk ya ku siyaseta wê ku bi van çeteyên xwe yên biyanî dikir ku herî dawî bi Itifaqa li ser Idlibê re winda dike dixwaze li cihekî din bi hezaran çeteyên Nûsra, Qaida û bermahiyên DAIŞ'ê yên li gel wê bibe Îraqê. Dema dibêjin Îraq ew Behse herêmên Başûr kurdistanê yên ku bi erêkirina PDK'ê dagirkirine dikin.
Li vir jî dixwazin van çeteyan li dijî tevgera azadiya gelê kurd bidin şerkirin.
Yanî dewlet Tirk li herêmê çi siyaset û Tevgerê dike di bingeha wê de qirkirina gelê kurde..